

Dumahîk: Jinik û

bavêje ber wî, wê were û ji destê te bixwe, tê karibî nêzîkî wî bibî.

Jinikê gotina pîrê xist serê xwe û berî da malê, berxek gurand û ji bo şêr amade kir.

Dema nîvroj bû, temûzê av di kûz de dikele, kes nikare serê xwe ji germa rokê derxîne.

Jinik dikeve kezeba rê de , berê xwe dide daristanê , û goşt dibe ji şêr re wek ko pîrê jê re gotiye. Çend roj bihurîn, şêr nêzîk bû, bi çavên aramî li jinikê dinerî û goştê xwe dixwar û li tenişt wê mexel hat, zik têr e dunya germ e, şêr ket xeweke giran, jinikê jî destê xwe di ser wî re dibe, wî dilorîne, hema bi dizî porekî ji porên şêr radike û bi lez xwe ji daristanê dişemitîne. Berê xwe dide mala şêx, ji kêfa lêvên wê naçin ser hev, dema dighê bal şêx dibêje şêxê min, va ye min porek şêr ji te re anî, de ka bihele mêrê min ji min hez bike!

Şêx jê dibêje, jina delal tu pir zîrekî; ka ji min re bibêje te çawa karîbû vî porî ji wî şêrê har bînî?

Jinikê çîroka xwe jê re veçirand.

Wê hingê şêx lê nerî û jê re got: Xanima ciwan, min ji te re got tu zîrekî gelo mêrê te ji wî şêrî hartir e ku tu nikarî xwe têkî kirasê wî?

Here riya dilê wî nas bike, û bizanîn birçîbûna wî têr bike.

29.04.2010

Îran di pileya sêyemîn a qaçaxa mirovan di cîhanê de ye

Zarokên ku di Îranê de tîn firotin pitir ji aliyê ajotvanan, melayên "Hewzeyên Êlmiye" û kedkarên Efxanî ve bi buhayekê pir kêmtî kirin. Herweha keç û kurên Efxanî ji Îranê bo welatên din bo destrêjiya cînsî tîne qaçaxkirin. Li gor NGO'an, eva di demekê de ye ku Îran ne tenê tu hewlek bo çareseriya pîrsa han nedaye, belkî

bixwe rêxweşker e bo qaçaxa mirovan û heta hinek ji karbidestên rejîmê jî bi awayek çalak mijûlî vî karî ne. Hêjayî gotinê ye ku Îran di van 6 salên dawî de hertim di pileya sêyemîn a qaçaxa mirovan di cîhanê de bûye.

Wezaretê karê Derve a Amerîkayê rapora salane a xwe li dor qaçaxa mirovan weşand ku tîde Îran di pileya sêyemîn a cîhanê de cih girîye. Li gorî çavkaniyan Îran welatek e ku bûye nuqteya destpêkê, cihê derbasbûn û meqseda mêr, jin û zarokên ku bo karê bi zorî û destdirêjiyên cînsî tîne qaçaxkirin.

Li Amedê peykerê Cegerxwîn hat danîn **Li Navenda Çanda Ciwanan a Cegerxwîn ya li Kayapînarê Amedê busta Cegerxwîn hat danîn.**

Di merasima vekirinê de peyama ku Şaredarê Kayapînarê, Zulkuf Karatekin ku ji sala 2009'an ve di girtîgehê de ye şandibû jî hat xwendin. Karatekin di peyama xwe de wisa got:

"Ez di wê baweriyê de me ku, berhemên ku xwendekarên me derxistine holê dê kedeke wan a çandî û civakî ji bo bajarê me hebe. Ji ber vê yekê hevalên me yên di Akademiya Cegerxwîn de dixebitin, dê keda wan pê çêbibe ku çanda me ya tî asîmîlekirin bigirînin pêşerojê." Paşê Wekîlê Şaredar Mahmut Dag axivî û got ku di sala 2010'an de navenda wan a çandê vebûye û ji wê rojê de 2 hezar xwendekar beşdarî qursên cur bi cur bûne."

Piştî axaftinan, peykerê Cegerxwîn hate vekirin. **Diyarname**



Ev herdu nûçe ji Rojname Agirî H. 162 hatine girtin